

POP KURD

04/2022 • Jimar 10

e-Kovara Çanda Populer



“JI BO MIN EV ALBÛMA KURDÎ,
NÎŞANEYA RÊZGIRTINA
MALBATA MIN E.”

ZARA


ÇI YE EV METAVERSE?



NARİN NADİROVA / PoPirs



JENERASYONA Z'YÊ



POPKURD

e-Kovara Çanda Populer
04/2022 • Jimar 10

Edîtor

Mistefa DOGAN
Ömer SONMEZ
Leyla OZKAPLAN

Bergsazî

Ridwan XELÎL

Rûpelsazî

GrafîKURD

📷 PopKurdKovar

📘 PopKurdKovar

🐦 PopKurdKovar




📺 PopKurdKovar

🌐 PopKurdKovar.wordpress.com

✉ PopKurdKovar@gmail.com

☎ +90 534 325 3629

Merheba xwînerên me yên delal. Piştî navberekê POPKURD bi hejmara xwe ya 10em li ber we ye. Heta ji me hat me xwest naverokeke rengîn û zengîn amade bikin. Em hêvîdar in kêfa we jê re were. Kerem bikin.



NAVEROK

**SEFEREK
BO EWROPAYÊ
BI OTOMBÎLÊ**
Osman MEHMED ▶ 4

XERÎTEYA NAVDARÊN KURD
Navdarên Kurd li ku derê dijîn? ▶ 11

DERHÊNERÊN ME NIHA ÇI DIKIN?
ARMANC DAYAN ▶ 15

BI ZARA RE HEVPEYVÎN ▶ 18

**JENERASYONA Z'YÊ;
EW JENERASYONA MEŞHÛR** ▶ 22

WE GO BÎLARDO?
Bawer Yaren ▶ 29

**POPPIRS:
NARÎN NADÎROVA** ▶ 32

RAPBÊJÊN KURD DIPEYIVIN ▶ 34

ME JI 10 KESAN PIRSÎ ▶ 39

ÇI YE EV METAVERSE!?
Rodî Ekinçi / Wedat Akdaş ▶ 43

SEFEREK BO EWROPAYÊ BI OTOMBÎLÊ - 1

Osman MEHMED



Yek ji meztirîn xeyala min bû ku rojekê bi otombîlê li seranserê Ewropayê bigerim. Gava ez zaro bûm, li Nisêbînê min xewnek dî û wek gelek xewnên min ew jî tu caran ji bîra min neçû; di bin Pira Eleman re min dida rê û piştî riyêke dirêj ez di nava otombîlekê de, derdor daristan û gir, şîreşîra baranê li piştî came û di nav cammalkan re min lewheyêke şîn didît: “Bonn”. Beriya bi deh duwazdeh salan jî min çîrokeke Hesenê Metê xwend di kovarekê de bi navê “Ber bi Bakur ve” ez ne şaş bim. Wê çîrokê gelek tesîr li min kir û min jî her dixwest rojekê, êvarekê, nîveşevêkê otombîla xwe biajom berev bakur hey bakur! Dîtina rê û rêgeban û çiya û daristan û deşt û gund û bajar û bajarokên welatên dûredest li seranserê cîhanê her bûye cihê kelecana û şadiyê li min. Ji loma êdî wext bû!..

Rastî min nêst ew bû ez sala 2020an vê daxwaza xwe pêk bînim. Lê kambaxa vayrosa Koronayê li me peyda bû û hemû planên me betal bûn. Min jî sefera xwe bo demekê taloq kir û îcar havîna 2021an min got; belê, êdî wextê seferê ye!

Ji bo sefera bi otombîlê ji Tirkiyeyê bo welatên Ewropayê hindek belge lazim in; serê pêşî helbet divê te vîzeyê Schengenê an paseporta kesk hebe û divê otombîl li ser navê te be an wekaletêke bi navê te be ku ji Noterê pesendkirî ye û dawiyê jî bîmeyê (sîgorte) kesk pêwîst e ku mirov wê jî ji bankeyê an kompanyayên bîmeyê derdixe. Bîmeyê taybet a tenduristiyê û kaskoya derve li ser daxwaza mirov dimîne.

Di vê seferê de hevriyêkî min jî hebû; bûrayê min Kak Hesen. 23yê Tebaxa 2021an min ji Enqerê da rê ber bi Karamürsela Kocaeliyê. Ji wir min Kak Hesen hilgirt û dotira rojê spêdê saet şeş û nîvan me da rê, ber bi Kapıkuleya sînorê Tirkiye û Bulxariyayê. Em teqrîben saet dehê sibehê gihîştin Kapıkuleyê. Dema çûyîna me, heyama vegera xurbetçiyên Tirkiyê bû, lewma jî li ser sînor qerebalixeyeke zêde hebû. Ji ber vê me li ser sînor wextekî zêde xerc kir; qedere 7-8 saetan em di dorê de man.




Piştî em ji aliyê Tirkiyeyê xilas bûn tiştêkî bala min kişand; otombîl berî bikevin nav sînore Bulxariyayê li ser riyeye axî çiravek hebû. Piştî min dî ji boriyên biçûk bi awayekî otomatîkî av dihat pişqandî ser otombîlan. Du gav bi wê de jî ji bo wê avê 5 Euro ji me xwestin. Paşê me fam kir ku ev qaşo dezenfektan e li dijî Koronayê! Wek têbînî; berî hûn ji Tirkiyeyê derketin, li deriyê sînore Kapıkuleyê, dikanên telefonan hene. Ji wir sîm-karteke Elmanî bikirrin. Me yek girt, bi navê “Ayyıldız”ê û bi saya wê sîm-kartê me karî li Ewropayê sûdê ji telefon, navîgasyon û internetê wergirin. Ew kart 1000 deqîqe axaftin û 20 GB internet li ser e û bi bihayê 30 Euroyî ye. Herwiha piştî hûn daxilî nava Bulxariyayê bûn li benzînxaneyekê Vignette Card bikirrin; ji bo otobanan ev şert e. Ew jî bi bihayê 15 Euroyan e û li ser sînore Bulxariya û Sirbiya polîs daxwaza vê kartê ji we dikan.

Piştî me sînor derbas kir berî em berê xwe bidin Sofiyayê, em li benzînxaneyekê rawestan û bêhna xwe veda. Herwiha divabû em sîm-karta ku me li Kapıkuleyê kirrî têxin telefonê lê me derzî an tiştêkî wek derziyê nebû! Axir jineke xurbetçî li wir bi hawara me gihîşt û ji me re lêxist. Ji ser sînor heta bi Sofiyayê teqrîben 300 kîlometre ye. Ji ber ku berî niha derbarê Bulxari-

yayê de gelek efsane hebûn û gelek tiştên xerab hatibûn gotin, me nexwest em zêde li ser riyan bisekinin û em heta Sofiyayê qet nesekinîn. Me li Sofiyayê bêhna xwe veda, me nanê xwe xwar û benzîna xwe dagirt. Saet bûbû dor 9-10ê şevê gava me ji wir da rê berev sînore Sirbiyayê. Ji Sofiyayê heta sînore Sirbiyayê 110-120 kîlometre ye. Em zû gihîştin nêzikê sînor lê teqrîben 10 kîlometre mayî ji sînor re, çaksazîya rê hebû û ji loma em li wir jî ji du saetan zêdetir gîro bûn. Nîvê şevê me sînor derbas kir û piştî bi 40 kîlometreyan em gihan bajarê Nîşê.

Wek têbînî; di dora her du sînorên Bulxariyayê û Sirbiyayê de nijadperestiya xurbetçiyên Tirk çak xwe dida der. Yê didîtin jimara otombîla me ne Ewropî lê Tirkî ye, dihatin û dixwestin me bitirsînin ji Bulxar û Sirban. Lêbelê di her du sînoran de jî ji xeynî nezaket û hurmetê em li rastî tu tevgerê wan a nêtxirab nehatin.

Rastî me plan ew bû em wê şevê li Belgradê bimînin lê li hev nehat û ligel Kak Hesên me got em wê şevê li Nîşê kon vedin. Baş e em man jî. Nîş bajarekî bedew û nazenîn bû. Şeva wê bi renekî din xweş bû, roja wê bi delaliyeyeke din. Mirovên wê jî gelek kubar û mirovperwer bûn.



Me ji aplîkasyona telefonê otêleke xweş tesbît kir hîna em di dora gumrikê de û em çûn wir. Sirbiya ne endamê Yekîtiya Ewropayê ye, Euro lê derbas nabe; dînarê Sirbî derbas dibe. Ji loma me bi karta krediyê heqê otelê da. Ew jî teqrîben 15 Euro digirt. Îcar piştî rojeke ewqas bi westan, me go ka em çend bîrayan binoşin û wisa rakevin. Me ji resepsiyonê her yek çend bîra xwestin lê bihayê bîrayan gelek giran bûn. Welhasil me du qatê heqê mayîna otelê da bîrayan û me li şaneşîna odeya xwe ya dest bi vexwarinê kir. Digel çilê havînê bû jî sar bû şaneşîn; ji ber otêla me li serê girekî bilind bû me beşek ji bajêr didît; lê ronahiyên lambeyan û serbanên avahiyên; serban her yek bi rengekî cuda hatine boyaxkirin.

Serê sibê beramberî çiyayan, me taştîyeke xweş xwar. Roja din çend saetan em li nava bajarê Nişê geriyên. Li nav bajêr û derdora wê gelek bermahiyên şer hebûn ji dema Naziyan û dema şerê Sirbiya-Bosna.

Dor saet 12ê nîvro me xatir ji Nişa bedew xwest û berê xwe da Belgrada paytexta Sirbiyayê. Rêgebana (otoban) navbera Niş-Belgradê seranser, dar, daristan û çiya bû. Dîmenên derdora rê

ewqas mirov mest dikir ku mirov nedixwest rê biqede. Nizanim ev riya 240 kîlometreyî çawa wisa zû xelas bû. Divê ez bibêjim ku li Sirbiyayê eynî wek li Tirkiyeyê bêyî kartekê bi pareyan dikarî heqê rêgebanê bidî. Em gihan Belgradê lê tevî ku em çend caran li heman cihê çerx da me cihek bo parka otombîlê peyda nekir.

Axir me ji xortekî pirsî û ew jî bû alîkar ji me re. Got; divê sîm-kartekê we ya Sirbî hebe, hûn pere lê bar bikin û cihekî bo ragirtina (parkkirina) taybet bibînin û dû re bi SMSê ji 9111 an 9112 an 9113an re bişînin û ev cih dibe yê we. Me sîm-kartekê ji kioskê (bûfeyekê) kirrî ku axaftin û 5 GB internet jî li ser bi bihayê teqrîben 5 Euroyî û ev mesele jî wisa çareser kir û me xwe berda navenda bajêr. Me berê xwe da cihên geştyariyê, birêveçûneke xweş bir serî.


Piştî em mandi bûn ji gerê di nav wan kolanên xweş de li kafeyekê ku tramway jî di ber re diçû me bêhna xwe veda; Coffee-Dreams. Qehwexaneya Xewnan, kulîçene xwe ya taybet hebûn û me bi qehweyeke tamxweş re bi wan kulîçeyan zikê xwe yî birçî têr kir. Şagird (garson) li Belgradê pirtir jin bûn; li wê qehwexaneyê wê keliyê mêvan jî pirtir mêr bûn. Kak Hesên got; “Çi jin çi mêr ev Sirbî çendî rindik û delal in!”. Min gotê; “Guman tê nîn e Kak Hesên!”.





Êdî berê me li Hungariyayê bû. Saet derdora 4an me ji Belgradê (Bajarê Spî) da rê. Ji ber ku Hungariya endamê Yekîtiya Ewropayê bû, ew sîm-karta ku me ji sînorê Kapıkuleyê girt, me yê dîsa bixista telefonê û bi kar bianiya lê ev nexwedîderzîbûn bûbû belayeke mezin li ser serê me! Navbera Belgradê û sînorê Hûngariyayê 200 kîlometre ye. Gava em li ser sînor di dorê de bûn me dît ku di dorekê de jî TIR hene. Min got, “Kak Hesên, hebe tunebe bi ajokarên TIRan re dê hebe, ew mala xwe li pişta xwe bar dikin.” Ji ber ku ez li ser sûkanê (dîreksiyon) bûm, Kak Hesên çû ji yek ji ajokaran xwest, bi rastî jî hebû û me sîm-karta xwe lêda. Ji Kak Hesên re gotibû, li cem me zêde hene, bila ew ji we re be. Em nêzîkê du saetan jî li ser vî sînorî gîro bûn. Saet li dor 8ê êvarê me berev Budapeşteyê da rê; ji sînor heta bi Budapeşteyê 180 kîlometre ye. Ji wê taştiya xweş a Nişê û wan çend kulîçeyên ligel qehweyê pê de me nan nexwaribû û em gelek birçî bûbûn.

Saet li dor neh û nîvan şeva Budapeşteyê bi hemû delaliya xwe pêşwaziya me kir.



Me xwest em pêşî herin xwarinekê bixwin pişt re em herin otelê. Bi tesadûfî em çûbûn navenda bajêr. Ez dibêjim “bi tesadûfî” ji ber ku bi rê de kabloya şarja telefona têk çûbû û şarja telefona min qediyabû. Otêla ku em ê li bimana jî nêzîk bû. Li tevahiya Ewropayê restoranên Dönerê gelek berbelav in. Me xwe li yekê ji wan qelabt û em ketin dorê; gelek qerebax bû! Piştî xwarinê em çûn otelê. Otêla me li cihekî navendî bû; 4 stêrk bû û şeva wê bi 40 Euroyî bû. Me çanteyên xwe danîn û em derketin da li Bûdapeşteyê ji xwe re hinekî bigerin.

Piştî em betilîn, dawiya şevê em çûn Irish Pubekê bi navê Becketss da westana xwe hindêk ji bîr bikin. Dixwazim bibêjim ku wê şeva Budapeşteyê şeveke rijî û bêruh bû digel ku şeva Îniyê jî bû! Xizmeta serwîsa çend cihan jî tevlî loqenteyê gelek nexweş bû û eleqedarî kêmbû û xelk jî dûreperêz bû. Helbet bi şevê ev tişt nayên famkirin lê wê şevê em rastî vê yekê hatin.



Roja dîtir em sibê zû rabûn. Me taştêya xwe li otêlê xwar û em qederekî li qeraxên çem geriyan. Saet 11ê sibehê em ji Bûda-peştayê derketin. Di ser Slovakiya û Çekyayê re em rastûrê çûn heta Elmanyayê. Êdî ji ber ku hemû welat yê Schengenê bûn, sînor nemabûn. Gava em gihan bajarê Gerayê saeta me bûbû 9ê êvarê. Li Gerayê em ê bibûna mêvanê bûrayê min Kak Mistefa, ango birayê Kak Hesên. Kak Mistefa li wir dimîne û restorana wî heye.

Ez berê bi du-sê salan hatibûm vî bajarî. Gera û Jena, li Rojhilatê Elmanyayê du bajarok in di navbera Dresden û Leipzigê de. Jena wek bajarê zanîngehan tê zanîn. Heta bi Karl Marx jî li zanîngeha Jenayê xwendiyê. Herwiha nivîskarê navdar ê Rûsî Alexandr Pûşkîn jî demekê li Gerayê maye. Gera wek “Gera Greiz” tê zanîn. Bajarekî bazirganî û sekenî ye lê mirov lê kêr xuya dikan. Tevî ku li wir ewqas kargeh û kompanî hene, dîsa jî mirov li cedeyan zêde mirovan nabîne, digel ku otombîl gelek lê xuya dibin.

Piştî du şevan êdî wext bû ez berdewam bim li geştê xwe. Kak Hesên li Gerayê ma û riya mayî min bi tenê birrî. Wêstgeha min a dorê Amsterdam bû. Dostê min ê qedîm Kawa Nemir li benda min bû. Navbera Gera û Amsterdamê teqriben 700-800 kîlometre bû. Şeveqê min taştê xwar, navîgasyona xwe vekir û di ser rêgebanê re da rê. Hewce ye ez qala taybetmendiya rêgebanên Elmanyayê bikim. Gava tu bi otombîlê herî ceza tune ye, te bivê saetê bi ser 300 kîlometreyî here, problem nîne. Tenê bi şerta tu şerîda çepê belasebeb dagir nekî û pir bi lez nekevî exitan/derçûnan. Heke tu vê bikî cizayê wê heye. Tiştêkî din jî bibêjim; li wan deran tu li benzînxaneyan bi destê xwe otombîla xwe tijî dikî. Ji ber ku ez neşareza bûm min hinek bi ser xwe de rijand jî carên ewil. Heta ez gihîştim Amsterdamê, seranserê rê şilî û baran bû. Min di cihekî de riya xwe şaş kir, baş bû min şaş kir. Ez di riya gundan re çûm. Çiqas gundên xweş bûn. Her du alî dar û daristan, xaniyên gundan; wek di filman de! Pir xweş bûn.



Axir piştî riyeke bi 8 saetan, ez di otom-bîla xwe de û derdor deşt û pirr ji otom-bîlên ser rêgebanê, şireşira baranê li pişt camê û di nav cammalka pêş re min li ser lewheyê kesek ev nav xwend: “Amsterdam”.

Kawa ji min re lokasyona xwe şand. Ez çûm wir û min dît wa ye Kawayê me li bisikleta xwe siwar bûye û tê pêşwaziya min.

Wek têbiniyeke axir; heta sefera me ligel Kak Hesên bû ji ber me pirranî suhbet dikir me pêdivî bi guhdarîkirina muzîkê nebû ew çend. Lê li ser riya navbera Gera û Amsterdamê her muzîk û bîrlêkirin û xewn û xeyal bûn; stranên min pirtir ji Rewşan “Diçim Diçim”, ji Pink Martini “Nanna Ninna”, ji Chris Rea “Road To Hell”, ji Mehmet Atlî “Pêşiya Malê”, ji Şivan Perwer “Ez Dilgeşê Can im”, ji Eric Clapton “Autumn Leaves”, ji Rachid Taha “Ya Rayah” û ji Ciwan Haco “Dûrî” û “Bilûra Min”...

Xwendeyên delal; riya min hêj berde-wam e. Hêj ez ê qala şevên Amsterdamê yên ligel Kawa û gelek tiştên dîtir bikim lê di hejmareke din de. Niha bila li vir kotayî pê bê.



XERÎTEYA NAVДАРÊN KURD

Navdarên Kurd li ku derê dijîn?

Unîversîteya Carolina Başûr a Emerîkayê, beriya çend salan li ser mirovên navdar lêkolînek çêkiribû. Fokûsa lêkolîne ji ev bû; kesên navdar li ku derê dijîn, li kîjan cih û meknan kêf û şahiyê dîkin, taybetmendiya meknanên ku ew lê rûdinên û niştecih in çi ne? Li gorî encama lêkolîne, mirovên meşhûr li gorî şertûmercên aborî û piyasayê ji xwe re li bajêr û semtan bi cih dibin û li wê derê dijîn. Yanî statuya sosyo-ekonomîk, civakî û rewşenbîrî dibe sedemeke sereke ku mirovên navdar li wê bajar, semt û cihê rûnin.

Dîsa li gorî lêkolîne, lîstikvan li cihê lîstikvanan, şa'ir li cem şa'iran, nivîskar jî li ba nivîskaran rûdinên. Yanî gettoyên navdaran bi vî awayî çêdibin û ew hema hema diçin heman bar, cafe, mekan û restaurantan. Lewra ev yek wek pîvaneke meşhûrbûnê tê dîtin. Unîversîteya Carolina Başûr bi lêkolînekê berfireh xerîteya / nexşeya navdaran a Ewropa û Emerîkayê derxistibû meydanê.

Baş e, gelo rewşa navdarên kurd çawa ne? Ew li ku derê dijîn, bo çi li wan bajêr û semtan bûne niştecih?

Wêne: Ekrem Yıldız



Navdarên kurd ên li Stenbolê herî zêde li Beyoglu yê ne! Te hew dît li Cadeya İstiklalê derketin pêş we.

Navdarên kurd ên li Stenbolê herî zêde li navçeya Beyoglu yê dijîn. Lewra ev navçe bo sînema, muzîk, şano û edebiyatê, yanî di warê çandî de navendeke giring e. Navdarên wek; Evdila Keskin, Selahattin Bulut, Ahmet Güneştekin, Eyüp Burç, Müslüm Yücel li Beyoglu yê rûdinin.

Hin navdarên wek Semyanî Perizade û Rawîn Sterk jî şênîyê semta Cihangirê ne. Şanoger Tuncay Ozel li Tarlabashi, stranbêj Mirov jî li Omer Hayyamê dijî.

Ji xeynî Beyoglu yê;

Şanoger Berfin Zenderlioğlu û Mihemed Bilen û Tarik Ziya Ekinci li Kadıköyê

Ciwanmerd Kulek, Hamid Omerî, Sînor Bapurî jî şênîyê Uskudarê ne.

Harun Elkî li Küçükçekmece yê

Tara Mamedova li Beylikdüzü yê

Dengbêj Kazo li Bağcılarê

Dr.Ahmet Kaya li Floryayê,

Rapbêj Xem li Eyüpê,

Keremo û Reqso li Bahçelievlerê,

Yavuz Ekinci, Seyidxan Sevinç, Murat Özyaşar li Kurtuluşê,

Zana Farqînî li Gaziyê

Suleyman Çevik li Zeytinburnu yê rûdinê.

Diyarbakir: Ofîs, Dîclekent û 75...

Navdarên kurd ji xeynî Stenbolê herî zêde li Diyarbakirê niştecih in. Diyarbakir jî êdî bûye navendeke siyaseta, çand, huner û rewşenbîriya kurdî. Navenda gelek sazîyên kulturî, weşanxane, şano û muzîkê li Diyarbakirê ye. Navenda Dicle û Firatê, Wêjehê Amed, Şanoya Bajêr a Amedê û gelek cih û mekanên kulturî û hunerî li Amedê ne û ev yek dibe sedema livûtevgerdariya xebatên çandî û rewşenbîriyê. Nivîskar, şa'ir, şanoger û muzîsyenên wek; Mehmet Atlı, Kerem Sevinç, Mirady, Malmîsanij, Şener Ozmen, Krîstîn Ozbey, Lorîn Doğan, Lal Laleş, Loqman Ayebe, Recep Dildar li Amedê dijîn.

Her wiha hêjayî gotinê ye ku ev salek e Botan Internationalê gelek xort û ciwanên zîrek ên li Diyarbakirê li derdora xwe civandine. Heta hin navdarên ku berê li Stenbolê dijiyan transferî Diyarbakirê bûne. Ji nîfşê nû kesên wek; Mirad Bayram, İnan Eroglu, Omer Faruk Baran, Ekrem Yıldız, Cumhuriyet Olmez, Bawer Berşev, Mem Armet, Adem Bulut, Gernas Nenas, Wahdet Uçar, Roza Sierra û Semiha Yıldız li Amedê dijîn.



Mêrdîn

Ji xeynî Diyarbakirê Mêrdîn jî starek e bo rewşenbîriya kurdî. Nivîskar, şa'ir, muzîsyen û derhênerên wek; İrfan Amîda, Xalit Tarî, Mem Ararat, Bilal Korkut, Miradê Miradan, Murad Dildar, Rênas Jiyan, herwiha akademîsyenên wek; Kenanê Nado, Şahab Wali, Abdurrahman Adak, Umran Aran jî li Mêrdînê rûdin.

Dengbêj Fadilê Kufrağî, Bajar Mîrzeman û Burhan Tek jî li Qoserê (Qezê) ne;

Bajarê Fenomenan: Batman

Batman jî bi fenomen û şanogerên xwe van salên dawî bûye bajarekî muhîm ê kulturî. Şa'ir, resam, nivîskar, şanoger û fenomenên wek; Berken Bereh, Fewzî Bilge, Merdan Newayî, Dicle Anter, Weysel Tirpan, Deno (Deniz Özer), Erdal Kaya, Bahoz Özsunar li Batmanê ne.



Wan: Bajarê behr û şî'rê

Bajarê Wanê êdî ne tenê bi behra xwe bi şairên xwe jî "navdar" e. Şair û nivîskar û lêkolînerên ciwan ên wek; Emerîkê Sidîqayê, Serhed Serhedî, Suat Baran, Armanc Dayan, Yehya Omerî li Wanê niştecih in. Herwiha nivîskar, muzîsyen, weşanger û edîtorên wek Xalid Sadînî, Sidiq Gorican, Hikmet Atli, Qahir Bateyî, Mihemed Şarman, Nurdan Şarman û Ferec jî li Wanê dijîn.

Hêjayî gotinê ye bi saya Chalak Events Wanê bernamê û organizasyonên çand û hunerê li Wanê zêdetir dibin.

Dîsa em bêjin ku navenda Weşanên Peywend û Sîtavê jî li Wanê ye û ev yek jî dînamîzm û reneke kulturî û rewşenbirî dide jiyana bajarê. Herwiha li derdora Tiyatro Mencilê jî ciwan berê xwe didin şanoya kurdî.

Enqere: bajarê li "kêlekê" maye.


Enqere; di siyaseta Tirkîyê de cihekî taybet e. Lê ev bajar jî hin navdarên kurd re jî bûye war. Şa'ir Osman Mehmed, muzîsyen Ercan Bingol, wergêr Newzad Valerî li Enqerê rûdinin.

İzmir

İzmir yek ji bajarên Tirkîyê ye ku hejmara kurdan lê gelek zêde ye. Weşanxaneya Nayê li İzmirê karê xwe dike. Nivîskarên wek Kovan Baqî, Ali Gurdilî, Berfo Barî, stranbêj Xecê, Yunus Dişkaya li vî bajarî niştecih in. Herwiha Med-Der, Avesta Ziman jî bo çand, ziman navendên girîng in.

Dêrsim


Dêrsim jî ji bo Kurdên Zaza û Elewî bajarekî girîng e. Muzîsyen Metin û Kemal Kahraman, Celo Bluz, li Dêrsimê dijîn. Dîsa Dogan Çelik, Mikail Aslan, Ahmet Arslan jî havînan li Dêrsimê dimînin.



**MA HÛN JÎ MERAQ NAKIN KA
DERHÊNERÊN ME NIHA ÇI DIKIN?
LI KU NE? BI ÇI RE MIJÛL IN?
ARMANC DAYAN PIRSÎ,
DERHÊNERAN GOT.**



DE FERMO!



DERHÊNER

Hûn niha li ku derê dijîn ? Li Kurdîstanê an dîasporayê ?

Hûn ji nav filmên xwe herî pirr ji kîjanê hez dikin ango filma we ya herî pirr li ber dilê we ezîz e kîjan e ?

Hûn a niha çi dikin û li ber destê we çi kar û xebat hene ? Heke hebin gelo hûn dikarin behsa wan bikin?

KAZIM OZ



Niha li Stenbolê dijîm

Pirseka dijwar e :) filmên min weke zarokên min in, ez nikarim neheqiyê ji tu yekê re bikim :) Her yek ji yê din xweşiktir e :)

Ez niha li ser filmeke nû dixebitim. Navê filmê Elîf Ana ye. Li Mereş, Meletî û Edene dikişînim.

ŞÊRO HINDÊ



Niha li Rojavayê Kurdistanê dijîm

Çîroka Bajarên Wêrankirî

Niha em haziriya filmekî dikin ku me filmnameya wî nivîsiye û heta payizê em ê dest bi kêşanê bikin. Fîlm li ser nasnameya Rojavayê Kurdistanê ye.

A.KEMAL ÇINAR



Li Amedê dijîm.

Hemû zarokên min in :)) Carna ji yekê jî hez nakim.

Niha li ber destê min fîlma min ya pêncan Beriya Şevê û beşekî ji rêze fîlma min ya Dilop heye. Xeynî wan jî amedekariya filmekî dinê jî heye, bi wî ra mijûl dibim.

ARSALAN AMIRI



Li diaspora / Tehranê dijîm.

Di nav filmên xwe da na lê di nav senaryoyên xwe da dixwazim hilbijartinekê bikim. Fîlma ku min nivîsiye û li ber dilê min ya herî ezîz e Nahîd e ku hevîna min Ayda Penahendeyê ew fîlm çêkiriye.

Bo nivîsîna senaryoyekê lêkolînan dikim.

**EBRAHIM
SAEDI**



Ez li Kurdistana Îranê dijîm (Rojhilat, Mehabad)

Mandoo (westiyayî) ji bo min pir girîng e, ji ber ku ji bilî kêşeya kurdî ew bi rêya fîlmên kurdî re xwediyê strukturên ceribandinên nû yên cihê ye.

Naha 2 Projeyên min hene ku ez di qonaxa post-produksiyonê de me. Belgefîlmek, li ser golekê ye ku ew zuwa dibe. Honakfîlmek, ku behsa rewşa şerê berê yê gundekî dike.

EMÎR XOLAMÎ



Niha li Rojhilatê Kurdistanê dijîm

Ez ji hemî fîlmên xwe hez dikim, hem Avahiya Jimare 13 û hem jî ji filma Darya Shake Wave û ... Bi rastî fîlmên min hemû zarokên min in.

Ez niha di zaningehê de mamoste me. Kurtefîlmekê çêdikim ku di qonaxa dawî de ye û ji bo metrajdirêjekê jî senaryoyekê dinivîsim.

**MARYAM
SAMADI**



Niha li Urmiyê dijîm

Hevina Qûlîngan

Niha du heb karên nû dikêşînim.

**BERI
SHALMASHI**



Niha li Amsterdamê dijîm

Min ji bo kanalên Hollandayê fîlmên televizyonê çêkirine, lê filma min a herî bi qîmet Ji Ser Banan Qêrîn e. Min ji bo gelê me, bi piştgirî û pereyên bi sedan kesî ev tişt çêkir.

Ez mamosteya senaryoyê û şewirmenda filman im û kuratora festîvala neteweyî me. Ji bo fîlm û rêzefilman senaryoyan dinivîsim û bo metrajdirêjekê amadekarivê dikim.

EVÎN BERAZÎ



Niha li Danimarkayê dijîm

Destpêk A Ji Serî De û Ji Gotinên Zarokan

Ez niha wek seroka jûriyê li ser Festîvala Navdewletî ya Kobanî dixebitim. Ji aliyê din ve ez amadekariya kişandina belgefîlm û kurtefîlmekê dikim.

BI ZARA RE HEVPEYVÎN

“JI BO MIN EV ALBÛMA
KURDÎ, NÎŞANEYA
RÊZGIRTINA MALBATA
MIN E.”

Wergera ji Rûsî: Firat Sözeri

Stara cihanê ya kurd
Zara di vê hejmarê
me de bû mêvana me.
Muzîsyena navdar di der-
barê xwe û jiyana xwe
de bersiv dan pirsên me.
Bo pêkanîna vê roportajê
em gelek spasî stranbêja
hêja Tara Mamedovayê
dikin. Ne ji wê bûya ev
hevpeyvîn pêk nedihat.

- Em dixwazin hinek seruvena te ya jiyane bibizin ji devê te. Zarokatiya te çawa bû?

Ji bo ku bersiva pirsê we bidim divê ez hinekê qala malbata xwe bikim. Ez li St. Petersburgê, di nav malbateke kurd de hatime dinyayê. Ez ji zarokatiya xwe ve bi

muzîkê re eleqedar im. Bavê min di warê muzîkê de her tim bawerîya xwe bi min anî û piştgirîya min ê herî mezin bû. Bi rastî min bi piştgirîya malbata xwe riya xwe ji berê ve diyar kir. Ez miroveke bextewar im, min xeyala xwe ya mezin pek anî û muzîk kir beşek ji jiyana xwe.

- Têkiliya te bi muzîka Kurdî re kengî û çawa dest pê kir?

Bavê min matematîkzan-fizîknas bû. Diya min dema ku min û birayê min ê biçûk mezin dikir, gelek dixebitî. Ligel vê yekê ez di nav derdoreke muzîkî de mezin bûm. Li malê me her tim muzîka gelên cihê yê cihanê dihat lêxistin û nûnerên pişeyên hunerî li ser heman maseyê bûn. Dema ku ez hê keçikeke biçûk bûm min muzîka Şivan Perwerer nas kir. Li mala me kasetên hunermendên din ên kurd jî hebûn. Ziman û çanda qedîm a gelê kurd tim di dil û guhê min de deng veda. Di derdoreke wiha de kesayeta min ava bû.

- Kurdî û hunera bi kurdî di jiyana we de teqabulî çî dike?

Em di malbata xwe de bi kurdî diaxivin û zarokên min kurdî fehm dikin. Ger em behsa xebatên min ên hunerî û civakî bikin, xebata min bi giranî girêdayî bi çanda etnîkî ve ye. Wek Hunermenda Aştiyê ya UN-ESCOyê ev çend sal in ez li ser pirsgerêka zimanên di bin xetereya tinebûnê û yekta de -di nav van de zimanên gelên piçûk ên cihanê jî hene- mijûl dibim. Serpêhatiya malbata min, koka min, têgihîştina min a kevneşopiyên gelên Rojhilat jî di gelek waran de alîkariya min dike.

- Ji berê ta niha li Sovyeta dengvedana muzîkê kurdî çawa ye? Tê zanîn an jî nasîn?

Li Yekîtiya Sovyetê, nifş, di hawirdoreke pirneteweyî de bi ziman, nerît û baweriyên cuda mezin bûn. Ji ber vê yekê ez dibînim ku muzîka kurdî wek çandên din ji aliyê guhdaran ve baş tê pêşwazîkirin. Îro li seranserê cihanê muzîka rojhilatî tê guhdarîkirin. Ji bilî vê, muzîka rojhilat dengên pir bêhempa derxistin.

“Guhdarên ji welatên cuda bi germî guh didin berhemên min ên kurdî.”

- Hûn li dinyayê gelek navdar in. Eleqeya guhdarên we li ser stranên ku hûn bi kurdî dibêjin çawa ye?

Ez gelek kêfxweş im ku guhdarên ji welatên cuda bi germî berhemên min ên kurdî guhdarî dikin. Ev rewş berhema pêvajoyeke taybet e. Li Moskowê di bin banê UNESCOyê de min ji sala 2017’an ve, sê salan festîvala muzîka etnîkî ya navneteweyî, “Muzika Dilên Me” li dar xist. Min hunermendên ji Sirbistan, Tataristan, Belarûs, Ozbekistan, Ermenistan, Sirbistan, Îsrail, Gurcistan û Tirkîyeyê li ser sehneyekê anîn cem hev. Gelê Moskow û mevanên wê reqîs, cil û bergên neteweyî yên cûrbicûr dîtin, çandên balkeş ên gelên cuda nas kirin. Di festîvalê de min stranên bav û kalên xwe bi kurdî strîn.

- Em dixwazin werin ser yekem albuma ku hûn ê bi Kurdî derxin. Fikra vê albumê çawa çêbû?

Ji zarokatiya xwe ve fikra min hebû ku albûmeke bi kurdî çêkim û belav bikim. Weke min berê jî got, muzîka etnîkî, ku her tim li mala me tê gotin û îcra kirin, parçeyeke jiyana min e. Ji bo min ev albûm nîşaneyê rêzgirtina malbata min e. Afirandina materyalên baş û berhevkirina komeke rast ji bo min girîng bû. Di albûmê





de min xwest ku ne tenê stranên gelêrî yên kurdî, yên ku ji aliyê hezkiriyên vê çandê ve tên naskirin, lê belê stranên nû yên ku bi taybetî ji bo min hatine nivîsandin jî bibînim. Dema ku hûn karê xwe bi azwêrî dikin, hûn her gav xelata wê distînin. Çend sal berê min stranbêjeke hêja, ku li çar aliyên cîhanê tê naskirin - Yasmîn Levy nas kir. Ew muzîka kurdî ji nêz ve nas dike. Straneke wê ya hevpar bi stranbêjê bi eslê xwe kurd, Îbrahîm Tatlisês re heye. Yasmîn Levy nivîskar û bestekara gelek stranên e ku di albuma min de cih digrin; “Keça Kurd im”, “Emane”, “Dayê”, “Welatê min”. Ya duyemîn jî, me bi efsaneyê muzîka kurdî Şivan Perwer re duetek kir. Hemû tekstên van stranên ji aliyê hevala min a nêzîk, stranbêja kurd a navdar Tara Mamedovayê ve hatine nivîsandin. Ez ji Tara pir hez dikim. Di nav wê de gelek dilovanî û germahî heye û her dem amade ye ku di demên dijwar de alîkariyê bike. Di albûmê de duetek me jî heye!

Yek ji stranên albumê jî ne tesadufî ye. Berhema “Dayê” diyarî ye bo diya min. Ev sirûdek e ji bo hemû dilên dayikên ku ji zarokan hez dikin û ji bo wan şayîşdar dibin. Xemgîniya dayikeke ya li ser zaroka xwe hesta herî xurt e.

-We sala 2021an bi Şivan Perwer re stranek got. Hûn karûbarên muzîsyenên kurd ên li Kurdistanê û Ewropayê dişopînin gelo? Kî diecibînin? Hûn çawa dibînin?

Belê, bi rastî sala borî promiyera klîba min a “Welatê min” pêk hat. Ev stran bi ferzaneke re sohbet e. Ji bo min Şivan hunermendekî mezin e. Ew hevalê bavê min ê pir kevn e. Dema ku wî pêşniyaza min a duetê qebûl kir, ez pir kêfxweş bûm û berhema me derket hole. Em kêfxweş in ku guhdaran ev stran pir eciband û strana me rastî eleqeyê mezin hat.

- Gelo we fikrek an projeyek heye ji bo li Kurdistanê konserekê bidin?

Belê, planên wiha hene. Ev çend sal in ez li ser vê yekê difikirim. Mixabin, her tişt bi min ve ne girêdayî ye. Niha em hemû dilên epîdemiye ne.

- Kurd gelek ji wê hez dikin. Bi riya kovara me hûn dixwazin herî dawî ji wan re çi bejin.

Spas ji bo her kesê ku piştgirî da albûma min a solo ya “Stranên Dilê Min”. Ji hemû xwendevanên POPKURD’ê re saxî û silame tiyê dixwazim. Tevî dûrbûnê jî, bila muzîk gelê kurd bike yek.



JENERASYONA Z'YÊ; EW JENERASYONA MEŞHÛR

DI DERHEQÊ WAN DE JENERASYONÊN DIN GELEK
TIŞT GOTIN. GELEK ANALÎZ Û ŞÎROVE KIRIN. VÊCA
DOR DORA WAN E. ME GOT KA BILA VÊ CARÊ EW BI
XWE BIAXIVIN BELKÎ ÇEND GOTINÊN WAN JÎ HEBIN.

- Hûn kengî hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûn? Çi tesîrli vê kir?
- Di jiyana rojane de, hûn bi hevalên xwe re, bi malbat û derûdora xwe re bi kurdî diaxivin an na?
- Di Kurdî de meyla we herî zêde li ser çi ye? Çima (Muzîk, şano, edebiyat, sinema, xebatên li ser medyaya sosyal û hwd.)
- Dema hûn bi çavê jenerasyona Z'yê dinêrin; bi ya we kêmasiya herî mezin a di warê xebat û berhemên kurdî de çi ye?



BİLGE

- Ez di 16 salîya xwe de hînî kurdî bûm. Berî wê min tenê du-sê hevokên kurdî zanibûn. Di sala 2016an da zarokekî cîrana me hebû. Ew bi tirkî nizanibû û kurdiya wê pir zelal û xweş bû. Min xwest bi wê re biaxivim, pê re eleqedar bibim. Wê demê di dibistanê de, hevalên min ên bi kurdî dipeyvîn hebûn û min kêmasiya xwe ya kurdî ferq dikir. Ji ber vê yekê min dest bi qursa kurdî kir. Nêzîkî salek û nîvî ez çûm qûrsê û fêrî zimên bûm.

- Di malbata min de kurdî nayê axaftin, xwişk û birayên min jî wekî min dereng hînî kurdî bûn û mixabin di mala me da kurdî wek zimaneke biyanî ye. Sedemeke wê jî ev e ku di zarokatiya me de, dê û bavê min Îslam-parêzên radîkal bûn û li gorî wan ji bilî Îslamê (ziman, netew, siyaseta) ti tişt ne muhîm bû. Paşê di malbate de gelek tişt hatin guherîn û hişyariyeke netewî peyde bû. Gava li derdora min kurdî tê xebardan ez jî bi kurdî diaxivim, ji bilî vê ez di jiyana rojane de mixabin pîranî tirkî diaxivim .

- Muzîk, wêje, şano, xebatên sosyal medya hemû jî bala min dikişînin. Herî zêde muzîka kurdî di jiyana min de ye lê roj bi roj wêje jî girîngtir dibe. Ez derûnnasiyê dixwînim û dixwazim di vê qadê de bi kurdî naverokeke dijîtal çêkim. Ji bo vê jî xwendina kurdî, şopandina weşanên kurdî, mirovên karê xwe bi kurdî çêdikin, di jiyana min de cih digrin.

- Kêmasiya herî mezin ew e ku jenerasyona Z'yê xebat û berhemên kurdî naşopîne û çênake. Ez wisa dibînim ku di jenerasyona Z'yê de hişmendiya netewî winda dibe. Ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû dinyayê jî wiha ye. Bi tesîra medyaya sosyal kesên deh salî û kesên bîst salî dikarin eynî mijarê biaxivin, eynî taymlîneyê bibînin, ferqa jenerasyona Z û Alfa'yê ew e ku bi lez û bez ji her tiştî agahdar dibin, fêrî tiştan dibin, dizanin ku jiyan ne tenê malbata wan e, ne tenê taxa wan e. Ji ber ku di medyaya sosyal de jiyanên cuda, kesên cuda dibînin. Bi vî awayî دنیا dibe taxek û qîmeta netew, ziman, çanda herêmi kêm dibe.



Dêsim Şaybak

- Ez di zaroktiya xwe de di nav malbata xwe de hînî zimanê kurdî bûm. Bi pirtûka çîrokan a birayê xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûm. Tesîra çîrok û stranên herêma me jî li ser min çêbû.

- Ez digel hevalen xwe hinek caran kurdî hinek caran tirkî û digel malbata xwe jî bi kurdî diaxivim.

- Ez gelek ji şano, muzîk û sînemaya kurdî hez dikim. Eleqeya min a li ser şanoyê pir zêde ye, wextê şano bi zimanê min be ez kêfxweştir dibim û meyla min zêdetir dibe.

- Mixabin kemasiya berhemên kurdî zêde ye. Ewîlî pirtûkên zarokan kêmin, wekî din jî berhemên wergerê, sînemayê û ya herî girîng berhemên şanoyê kêmin.

JIYAN BARAN

- Dema ku hînî tîpen latînî bûm, pê re hînî kurdî jî bûm. Bi gotîna Serhedîyan; tesîr hewce nîne. Kurd im û ya pêwîst ev e.

- Belê dayika min bi tirkî nizane û tirkî qet li dilê min rûnanê. Bi hevalên xwe û derûdorê re jî herî zêde bi kurdî diaxivim.

- Meyla min li ser hemû karên bi kurdî ye lê herî zêde bala min li ser muzîkê ye û ez bi xwê jî muzîkjen im.

- Dema ku ez li hemsalên xwe dinerim, ji bo kurdî xemgîn dibim. Jixwe dema ku li keçên me dinêrim tew xemgîntir dibim, ji ber ku di navbera xwe de kurdî xeber nadin.

MISRA DOĞAN

- Min di 17 saliya xwe de dest bi xwendin û nivîsandina kurdî kir. Tevî tesîra bavê min û apê min, kesên li ser kurdî xebat kirine jî li min tesîr kirin. Apê min bi kurdî dixwend, bi şevan carna gazî me dikir, wî em hînî peyvên kurdî dikirin. Herwiha bavê min jî li her dere bi îsrar kurdî dipeyivî. Vê eşqa wî ya li ser ziman, tesîr li ser min çêkir.

- Di nav malbata me de kurdî tê axaftin. Herçiqas me li mekteban bi tirkî ders didîtin jî, êvaran dema em vedigeriyan malê kurdî hebû. Dapîr û bapîrên min bi kurdî bi me re dipeyivîn. Wekî din; ji ber ku di jiyana rojane de îmkana me tune em xeber bidin,

di komên medyaya sosyal de, bi pismam û dotmaman re em bi kurdî ji hev re dinivîsin. Ji ber ku em naxwazin vî zimanî ji bîr bikin. Ziman her tişt e.

- Helbet bêhtir muzîk bala min dikşîne. Ji ber ku muzîk li her qadê ye û muzîka kurdî gelek pêşketî ye. Helbet meyla min li ser edebiyata kurdî ye jî. Ez gelek ji xwendina Mehmed Uzun hez dikim. Û hewce ye bêjim ku berhemên Mehmed Uzun ji bo me ciwanên kurd diyariya herî mezin e.

-Helbet di hemû qadan de kêmasî hene û ev pir normal e jî, lê ez bawer im ciwan çiqas barê ziman hilgirin mile xwe, ev kêmasî dê zûtir safî bibin.


NURSÎMA ŞAYBAK

- Ez bi saya malbata xwe hîn bûm, ji ber ku bavê min û xwişka min a mezin dizanibûn.

- Ez bi malbatê re bi kurdî diaxivim lê bi hevalên xwe re piranî bi tirkî dipeyivim.

- Ji şanoyên bi kurdî hez dikim, lê meyla min herî zehf li ser muzîka kurdî ye.

- Bi min her tişt baş e lêbelê ger ji bo zarokan xebatên zêdetir bên kirin dê baştir be; wekî Youtuberên kurd. Çimkî zarok bi şev û roj YouTuberan temaşe dikin.



ÖZGÜR

-Ez ji zarokatîyê ve hînî kurdî bûm û zanîna zimanê dayikê tesîreke baş li min kir. Ji ber ku kesekî zimanê xwe yê zikmakî nizanibe nikare zimanên din jî baş bizane .

- Bi piranî erê. Heta hewcehî nebe bi zimanekî din naaxivim.

-Herî zêde eleqeya min bi wêje û muzîkê re heye. Ji ber ku herdu jî li nav civakê baş tên zanîn .

-Li gorî min kêmasiya herî mezin ev e; kesên perwerdeya kurdî didin bi xwe jî zarokên wan piranî bi tirkî diaxivin. Û ziman hebûna hemû tiştên civakê ye, lewma jî kesê bi zimanê xwe yê zikmakî nepeyive nikare ti berhemên baş biafirîne..



WE GO BÎLARDO?

BAWER YAREN





Kurd di kîjan lîstikê da an jî di kîjan sporê de baş in? Kişik di dîroka kurdan de cihekî fireh digire. Em dikarin bêjin di kişikê da em baş in. Dame ji lîstikên pêşiyên me ye. Li ser meselê; bapîrê min Sofî Celîl hosteyekî damê bûye. Wekî wî bi hezaran hebûne û hê jî hene. Herçiqaş lîstikên hêsan jî xuya bikin, esas kişik û dame lîstikên mêjiyî ne. Bîlardo jî lîstikeke mêjiyî ye. Lê tenê mêji têr nake ji bo bîlardo. Fizîk divê, geometrî û teknîk divê. Derûnî jî perçeyekî vê sporê ye.

Fizîknasê navdar Nicola Tesla derheqê bîlardoyê da wiha dibêje: Bîlardo belkî jî lîstika herî zehmet a mikemelbûnê ye ku ji girêdana bêhempa û eşkere ya navbera kombînasyona kişikê, yasayên fizîkê, mêjiyê mirovan û tevgerên wan ên wicûdî pêk tê.

Di cihanê da piranî lîstik bi topê tên lîstin. An jî em bêjin ên populer. Mînak; futbol, basketbol, voleybol, golf, tenîs, bowling, bîlardo û hwd. Helbet kurd jî ji cihanê kêmanemane, bi van lîstîkan re eleqedar bûne.

Lê ez dikarim bêjim bîlardo ji bo kurdan lîstikeke nû ye. Herwiha tiştê ku ez zanîm; di salên 80yî de li Bismilê û Amedê eywanên bîlardoyan hebûne. Lê niha eywanên bîlardoyê li Bakur gelek in. Û herçiqaş diçe meraqliyên vê werzîşê jî zêde dibin.

Peyva “Bîlardo”yê ji “Billards”ê tê. Billards peyveke frensî ye. “Billes” top e, “ard” jî “huner” e. Yanî bi topê huner tê kirin. Dîroka bîlardoyê ne diyar e. Li ser meselê ingilîz dibêjin cara yekem li ba me hatiye lîstin û frensî jî dibêjin li cem me. Texmîn dikim bîlardo cara yekem li Fransayê hatiye lîstin.

Bi ya min lîstikên ku bi topê tên lîstin dibin 2 cure. Lîstikên li ser maseyê tên lîstin û yên ku li sehayê tên lîstin. Mesela futbol li sehayê tê lîstin. Lîstikên wek bîlardoyê jî li ser maseyan tên lîstin.

Belê, bîlardo li ser maseyê tê lîstin. Maseyeke çargoşe. Qeraxên dirêj 281 cm, qeraxên kin jî 154 cm ne. Bilindbûna maseyê 78-81 cm, giranbûna wê jî 700 kg e.



Li ser maseyê mermer hene û li ser mermer jî xêliyêk heye ku ji vê xêliyê re dibêjin “çuha”. Rengê çûhayê piranî şîn e. Lê rengê kesk, sor û gewr jî hene. Dema ku we li topekê xist, top çawa di nava wî çar goşeyê de diçe û tê? Helbet top li tiştêkî nerm dikeve û dipeke. Cihê ku top lê dikeve û topê dipekîne, “band” e. Yanî navê qeraxên meseya bîlardoyê “band” e.

Alavên bîlardoyê ji top, isteka, mase û tebeşîrê pêk tên. Mase, isteka û tebeşîr sabît in lê hejmara topan li gor cureyên bîlardoyê diguhere. Bi isteka darê meriv li topan dixê, meriv tebeşîrê jî li serê istekayê dixê; ji bo ku dema li topê dixin serê isteka neşemite.

Cureyên bîlardoyê: 3 top, Emerîkî (Poll), Snooker 8 top, 14+1. Di nava van cureyan de ya ku herî zêde tê lîstin 3 top e, dû re jî bîlardoya Emerîkî ye. Bi kurtasî ez ê behsa ya Emerîkî bikim û dû re ez ê qala 3 topê bikim.

Di lîstika Emerîkî de 16 top hene, li ser van topan hejmarên ji 1ê heta 15an hene. Di maseya Emerîkî de 6 qulik hene (di nav gel de wek lîstika biqul jî tê binavkirin). Ji van 16 topan yek jê topa spî ye. Bi vê topa spî topên din dixin qulikan.


3 top di nava xwe de dibe 2 cure: Karambol û 3 Band. Karambol bi 3 topan û bi du kesan tê lîstin. Rengê topan zer, spî, sor e. Her lîstikvanek ji xwe re “de-q”ekê hildibijêre. A zer an jî ya spî. (Topa sor nabe deq.) Ger lîstikvan deqa xwe li herdu topên din bixê puanekê qezenc dike

û dikare yeka din jî lêbixê. Ger ku nikaribe li her du topan bixê, dor derbasî lîstikvanê din dibe. Lîstik bi vî awayî heta 30 puanî dewam dike (puan dikare biguhere jî, 30, 40, 50...).

Tiştê me ji bo karambolê got, meriv dikare bo 3 Bandê jî bibêje. Bes ferqek heye ku ev ferq her du lîstikan ji hev dike. Di 3 Bandê de deqa lîstikvan herî hindik divê 3 bandan bibîne, dû re li ya din bikeve.

Herçiqaş min behsa bîlardoyê kiribe jî, miheqeq tiştêkê mane. Daxwaza min ev e ku bîlardo di nav kurdan de belav bibe. Bikî nekî gotin û dîtin nabe yek. Kesên ku vê werzîşê miraq dikan, dikarin bibin mêvanê eywana me ya bîlardoyê. Wê çaxê bi ta û bi derzî ez ê karibim behsa bîlardoyê bikim. Eywana me li Bismila Diyarbekirê ye. Nav û edresa wê jî ev e; Kerem bikin werin:

Taxa Altîokê, Kolana 607. Binî Apartmana Yarenê, Yaren Cafe & Bîlardo Salonu. Bismil/Diyarbekir.



NARÎN NADÎROVA

POP PIRS



Narîn Nadîrova li Ermenistanê hatiye dinyayê. Xwendina destpêkê li Ermenistanê, xwendina bilind li Qazaxistanê li ser finansê kiriye. Nadîrova, ji 30 salan zêdetir e ku li Alma Ataya Qazakistanê dijî û li seranserê Qazaxistanê CEOya Home Credit Bankê ye.

Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Aştî.

Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Gava ku dibînim çavên zarokê ji şabûnê dibiriqin...

Tehemula te ji çi re tune ye?

Tehemula min ji “durûtî û neheqiyê” re tune ye!

Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Min herî zêde dixwest Selehedînê Eyûbî nas bikim.

Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyala min a herî mezin ew e ku ez dibistanêke bi zimanê kurdî ava bikim.

Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

“Kurdistanê Kurdistan

Bexçê gulên derdê dilan

Îro maye li bindestan

Barê giran li ser milan...”

Çi kenê te tîne?

Siyasetmedarên bêprensîb kenê min tînin.

Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Herî zêde ji dengê çivîkan û dengê ava çem hez dikim...

Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Helbet min ê dîsa li gorî hêz û qeweta xwe alîkariya însanan bikira...

Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Bêdengî...

Dîmeneke çawa te aciz dike?

Dema zarok bêçare ne, herî zêde jî bêçaretiya zarokên penaber dilê min diêşîne û min aciz dike mixabin...

Te dixwest tu li ku derê bijî?

Min dixwest di xaniyekî kevir de bijim û darên zeytûnan jî di hewşa wê de hebin...

Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Ez gelekî birêkûpêk û bi disîplîn im. Qisûra min a herî mezin ew e ku ez ji mirovan jî vê disîplîn û rêkûpêkiyê dixwazim û ji ber vê yekê car caran wan aciz dikim...

Tu dixwazî çawa bimrî?

Pirsa herî zor! Dixwazim bi şev razêm û serê sibê bimirim. Yanî dixwazim bi rihetî bimirim...

Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Min çi kiribe ev in, ji kerema xwe yên mayî jî hûn bikin...



RAPBÊJÊN KURD DIPEYIVIN

- Rap ji bo te çi ye?
- Bi ya we kurd ji Rapê hez dikin?
"Piyaseya" Rapa bi kurdî çawa ye?
- Hûn hemû karên xwe bi tena serê xwe
dikin? (nivîsandina gotinên stranên,
konser, danasîn û hwd.)
- Îdolekî/e we heye di rapê de?

REQSO

Ji Misirca Sêrtê ye.

Di sala 2012an de dest bi Rapa kurdî kir.

Xebatên wî heta niha bi awayekî sîngle û video-klîb hatine weşandin. Niha jî li Stenbolê dimîne

- Şêweya xweravekirinê, sekna sewta di hundirê min de, bersiva hest û serpêhatiyên min e.

- Kurd reşikên vê serdemê ne, reşiktî di dilê her kurdekî de heye. Yanî ev tê wê wateyê ku her kurdek bi xwe Rap e!

- Ezamet e, hevalên bişiyar û ciyawaz gelek in, gav bi gav, roj bi roj bi hewldaneke baştir rû dide.

- Di destpêkê de kêfxweş im ku hewl didim hemû karên xwe bi xwe bikim, Herwiha nivîsên stranên xwe bi xwe dinivîsim, bingehên muzîkê jî bi gelek hevalên beatmarker re çêdikim. Menajer di piyaseya muzîka kurdî de kêr in, hema bêje tune ne û ev kêmasiyeke mezin e, ji ber wê hewce ye muzîkjenên kurd ji xwe re rêbazan peyda bikin û ji hev re bibin alîkar

- Îdolên min ne yek in, gelek in. Kî bikaribe bi xebat û xîret serkeftinê bi berdewamî û bi pergala bidomîne, ew bo min îdol e!



RONÎ ARTÎN

Sala 1992yan li Qoserê ji dayik bûye. Di 2008an de dest bi hiphopê kiriye.

Artîn heta niha 10 stran û 6 klîb belav kirine. Karên production û art-directionê jî dike û niha li Mêrdînê bi cotkariyê debara xwe dike.

- Reva ji acizî û xemgîniya jiyane.

- Eger tu dest bidî dilê wan û hîsên wan bêjî çima hez nekin?

Hêvî her heye û bawerî her dem bûye rêber ji me re.

Erê em rapbêj kêr in lê bi guhdarên xwe re em zêde û xurttir dibin.

- Berê wisa bû û ji bo me gelek zehmet bû. Ez zêdetir li stranên xwe serê xwe diêşînim. Ji bo min hunermend tenê hunermend e. Ne tucar, an tiştêkî din. Vî tiştî ez li xwe danayim. Ez hunermend im û wekî hunermend dijîm. Ger danasîn û organîzasyon û tiştên din bikim ji hêla hunera xwe ve kêr dibim û kêr dimînim.

- Serhado ji bo min wekî rêbêrek e. Her dem jî dê wisa dimîne. Min rapa kurdî pê re dît û nas kir. Îdolên min ên din jî hene ji xeynî rapê; Aynur Dogan, Hîvron, Mehmet Atli û Ciwan Haco ji bo min bi hunerên xwe, bi şexsiyetên xwe îdol in.



SÎMYAGER

Di sala 1997 an de li Amedê ji dayik bûye. Li zanîngeha Mûnzûrê ya Dêrsimê beşa Endezyariya Elektrîkê xelas kiriye. Ev demeke dirêj e bi muzîka Rapê re mijûl e. Ji 2018an vir ve bi awayekî profesyonel berheman diafirîne.

-Destpêka min a Rapê bi kekê min re çêbû. Gava emrê min 6-7 bû, bawer im ew jî 12-13 salî bû û tim Rap guhdar dikir. Wê demê derfetên lêkolînan jî pir kêmbûn û muzîka Rapê cara yekemîn bi zimanêke biyanî li ber guhê me ket. Ji wê deme heta niha ez wekî guhdarekî di nava vê çandê de me... Hestên min di nava min de weke Rap tevdigerin û ji min jî weke Rap belav dibe. Rap jî bo min, riya parvekirina hestan e.

-Çanda Rapê her çiqas jî çanda me dûr xuya bike jî, ji aliyê serhildêriyê ve xwe li me digre û afirandina Rapê ya ciwanekî kurd, tesîr li kal û pîrên kurdan jî dike. Mesele li ser afirînerê Rapê dimîne... Xweşî û pirs-girêken me ji hev ne cûda ne. Mirov çiqas jê dûr bikeve jî bazara hûnerê jî meseleyek e mixabin. Armanc parvekirin e, mirov helbet dixwaze teknolojiyê bi kar bîne lê em ne wekî wan bazarcîyan in ku diqîrin û dibêjin "3 kîlo milyoonek."

-Çîrok û helbestan ez bi xwe diafirînim. Helbet tesîra tiştên ku mirov dixwîne û guhdar dike li ser mirov çêdibe lê ez bala xwe didimê û serî pê diêşînim... Ji bo avakirina muzîka bingehê jî ji hevalên xwe alîkariyê dixwazim, bawer im yê bi vê muzîkê re mijûl in navê DJ Xodî bihistine. Ew jî ked-karekî kevn ê vê çandê ye, ez xebatên wî pir dicibînim û bi wî re dixebitim. Ji bo konser û hwd. jî em bi sazîyan re têkilî datînin.

-Niha em li taxên Kurdistanê bigerin û pîrsa Rapa kurdî bikin jî sedî 90 ew ê navê Serhado bidin. Ez jî yek ji wan im. Lê ez naxwazim ji aliyê mamostetiyê ve bersiva xwe tenê bi muzîka Rapê re berteng bikim. Hemû Dengbêjen me (bi taybetî Şakiro), Hozan Serhad, Koma Wetan, Rotînda, Siya Şevê... Hemûyan navê xwe li ser hunera kurdî de kolane û ji bo nîfşên nû îdol in.

XEM

Ji Batmanê ye û 27 salî ye. Di navbera sala 2010 û 2015an de wekî amatorî karê xwe yê muzîkê kiriye, piştî 4 salan navberê di sala 2019an de vegeyriyaye muzîkê û dest bi kariyera xwe ya profesyonel kiriye. Di sala 2019an de albuma wî ya EP (Biyar, Newroz, Payîz) derket. Di destpêka sala 2021ê de bi stranbêj Jehrmar re strana "Bikene" got û belav kir. Herî dawî albuma wî ya nû ku di nav de 10 stran hene, wekî sîngle (yek bi yek) belav bû.

- Mîsal ger muzîk ji bo min jiyana be, Rap jî ji bo min wateya wê jiyana ye... Û ez dixwazim bibêjim ku ez xwe tenê wek rapbêj nabînim, her wiha stranbêj im jî.

- Ez dibêjim hez dikin lê bi hêvî me ku ew ê zêdetir hez bikin.

Piyaseya Rapa bi kurdî vala ye yanî rapbêj kêma in, herwiha piyase bê bîngeh e yanî hê jî endustriyek tune ye.

- Belê ez muzîkjenekî serbixwe me û hemû karên xwe bi tena serê xwe dikim.

- Gelek kesên ku ji wan îlham distînim hene lê dikarim bêjim tenê The Weekend ji xwe re wek îdol dibînim.



ME JI 10 KESAN PIRSÎ

**YEKEM BERHEMA TE BI KURDÎ XWEND
KÎJAN BÛ? TE ÇI HÎS KIR?**





Şîraz Baran

“Mîrname” bû, pirtûka Jan Dost. Dibêjin kurdiya navenda Diyarbekirê ji Îngiliziya Hîndûyan xirabtir e. Yeşîn dikim wîsa ye. Ez li kuçeyen Diyarbekirê mezin bûm, yanî dikarim bêjim “gedê bajêr” im. Îhtimaleke mezin bû ji zimanê min ê tewşo mewşo fehm nedikir, li mala me ya paşiya parka Esmâ Ocakê, rojekê yekê pirtûkek danî pêş min. Destpêka şerê Kobaniyê bû. Got bixwîne, min xwend. Zimanê pirtûkê zehf zelal û hêsan bû bo min. Sankî kuçeyên bajêr ez hê neherimandime û diya min a rehmetî di odeyeke bêceyran de ji 5 saliya min re xebroşk digotin, rûpel wek ava çêm diherikîn li ber çavên min. Ew li aliyekî, Jan Dost metaforên ku ez ji nivîskarên Emerîkaya Latîn hîn bûbûm li ber min dixistin. Qala qelem û dîwêt û ayetên

şehwetê dikirin. Mey dibû kilîta zimên û diket nav hibrê. Dû re, roja ku Xanî dimir, nivîskêr ew hibr dibarand ser serên millet. Min di ber xwe de digot gere ew xwelî bûya. Belkî jî ev metafor bû ku kurdî û edebiyata Jan Dost bi min da hezkirin. Ji wê rojê û wê pirtûkê şûn de min xwendina kurdî ji dest nexist. Sal bihurî, ez şofêr, Omer Faruk Baran bi bluetooth û telefona xwe li kêlekê runiştî, Baqî Xido bi dengê xwe yê tenik “Delalê Qîzika” bang dikir û Suzukiya me ya frên-sist li ser deşta Sirûce ber bi sînore Kobaniyê ve hedî hêdî diçû. Bajarê ji kevirên boz çêbûbû, hilwedîşiya her ku em nêzik dibûn. Baqî diqîriya û dikuşt, qedehên araqê li hev diketin, lê dinya çikî sayî û mehleyên binxetê mîna miriyekî bêdeng. Ew bergeha talan çawa rêz bû li ber me, edî nema camêrê paşî xwe avêt derve. Dema min Mîrname xwend, hibr dibariya; min ji ku zanibû îja wê ne hibr, lê hêsrên Jan bibarin, li pêş min, li hemberî Kobanî?



Ceng Yiğit

Yekem berhema ku min bi kurdî xwend, pirtûka Ferhad Pîrbalî ya “Hotel Europa” bû. Heta vê pirtûkê min pirtûkên bi zimanê tirkî dixwendin. Gava cara yekem min ev pirtûk xwend ji aliyê hêstî ve ez gelekî kêfxweş û serfiraz bûm. Wexta ku min ew pirtûk dixwend yekem tiştê ku min fêhm kir ew bû ku zimanê tirkî têra hestên min nakin. Zimanê ku ez di malê de dipeyvîm, zimanê ku ez pê mezin bûbûm

û zimanê ku ez pê hatibûm avdan zimanê kurdî bû. Ji ber vê yekê jî terîfkirina bextewariya xwe, ez nikarim bînim zimên.

Cihê Ferhad Pîrbal li cem min cuda ye. Çimkî yekem car min bi pirtûkên wî dest bi xwendina berhemên kurdî kir. Di nav berhemên wî de jî pirtûka “Hotel Europa” jî bo min girîng e. Wekî din, min dît ku zimanê kurdî jî di asta zimanên navneteweyî û wêjeyî de ye. Mirov carna nikare hestên xwe bîne zimên. Lê gava min ew pirtûk xwend hinekî ez li ber xwe ketim ku çima min heta niha bi zimanê xwe pirtûk nexwendine.



Selma Türe

Min rojekê rahişt romana Bextiyar Elî ya bi

navê “Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir.”

Bi tesîra wê ez mest bûm! Ez fikîrim heta niha min çima bi vî zimanê zêrîn û balkêş nexwendiyê. Nema dixwazim bi zimanekî din bixwînim, ji xeynî yê xwe!



Ozgur Keleş

Ez 10-12 salî bûm, wê demê birayê min ê mezin carinan helbestên Cegerxwîn û Ehmedê Xanî ji me re dixwendin. Ew ne zimanê ku em rojane diaxivîn bû, lê me pir baş jê fehm dikir. Dema ku me fehm nedikir, birayê min çend ayet dixwendin, mîna ku bixwaze kûrahiya wê fehm bike. Dema ku birayê min helbest şîrove dikiirin, min hêzeke xerîb di hundirê xwe de hîs dikir. Bi wê cesareta ku vê hêzê da min, dema ku êdî birayê min tune bû jî, min pirtûk girt destên xwe û lêkolîn kir. Ji pirtûkên mamosteyan dabûn me ne cuda bûn. Bergê wê hebû, nivîsa wê ne bi destan bû. Lê ji ber ku nivîsa tê de bi kurdî bû ew ji bo min cuda bûn. Helbet min

nikarîbû van pirtûkan bixwînim, dema ku min hinekî din pirtûkxaneyê mala me tevlihev kir min Nûbihar dît. Hem nazik û hem rengîn bû. Her çend min nekarî piraniya tiştên ku hatine nivîsandin bixwînim jî, ez pir bi heyecan bûm ku wê hilgirim û li naveroka wê mêze bikim; bê guman hesteke xweş bû. Paşê min hewl da bixwînim, gelek peyv hebûn ku min jê fehm nedikir. Ev dihat wê wateyê ku ez her gav hewceyê yek ji mezinên malê bûm. Ji bo min pir zehmet bû ku ez bi tena serê xwe bikaribim bixwînim. Li ber çavê heval û mamosteyên xwe yê dibistanê, ez xwendekareke serkeftî û xebatkar bûm ku zû dixwend û tiştê ku dixwend fehm dikir. Lê niha li vir, li malê, min nikarîbû bi zimanê xwe bixwînim û tiştê ku dixwînim fehm bikim. Min ji vê yekê hem şerm kir hem jî hêrs bûm. Min ji serkeftin û xebata dijwar a ku ji min re hatî veqetandin guman dikir. Ez bi van nakokiyên di hundirê xwe de mezin bûm.



Sewda Hekaryan

Yêkem kitêba kurdî ya ku min xwendî di sala 2021ê de ya Îhsan Colemêrgî; “Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan”. Heta wê rojê min bi zimanên din gelek kitêb xwendibûn lêbelê hîssa vê kitêbê daye min çî kitêban nedaye min. Min kitêb jiya, ez li gel Binevşê giriyam, li gel Cembelî êşiyam,

li çol û zozanên Kurdistanê û Colemêrgê geriyam. Min hingî zanî ku mirov zimanê hemû cihanê bizane jî ne wekî hîssa zimanê dayikê ye. Mirov her çend muzîka cihanê guhdar bike jî her dîsa gotin û muzîka zimanê mirov, bi mirov cuda û taybet e. Kitêb û çîrok jî her wisa ne. Bi ya min erotîzm û eşq gelek li zimanê kurdî tê, di vê kitêba min xwendî de jî eşq û erotîzmeke kûr û efsûnî hebû. Di vê dinyayê de çî hebe eşq e, eşq jî bi kurdî xweş e.



Mursel Ekici

Yekem pirtûka kurdî ya min xwendî pirtûka Mehmed Uzun a bi navê “Siya Evînê” bû. Ne şaş bim sala 2000î de bû. Heta wê demê kurdiya min bi xêra malbatê bi devoka Badîni bû û kêmasiyek jî di kurdiya min de tune bû. Bi tenê peyvên

di kurdiya standard de ez ketim zoriyê lê bi xêra ferhengê min bi rûyeke spî pirtûk tewaw kir. Pişt re min xwendina vê pirtûkê dubare kir. Di rûpelên destpêkê û her hevokekê de bi qasî nivî deqîqeyî rawestiyam, lezeta kurdiyê digihîşt dev û lêv û polkeyê min. Pişt re çîroka pirtûkê xwe li min aland. Min di wê demê de zanî ku di Kurdistanê de St. Petersburg, Parîs û Stenbol heye û yek ji mifteyên deriyê dinyayê jî kurdî ye.



Derwêş Alî Işık

Di nav pirtûkên kurdî de ya yekem car min xwendî, pirtûka Îhsan Colemêrgî bû. Wextê min “Cembelî Kurê Mîrê Hekariyan û Binevşa Narîn” xwend, ew çîroka bi dehan daran dapîra min li bin konên me yê reş ên li zozanên Berçelanê ji bo min behs kirî... Ew roj

hatin bîra min. Ew rojên ji zozanên Berçelanê heya zozanên Nebirnavê yê her sal min çend mehên havînê lê derbas dikirin, wekî fragmanekê hatibûn ber çavên min. Kanî, gol, keviyên belekatiya berfê, di nava romanê de xwe didan der. Çîroka romanê çîrokeke rastîn bû, ji ber wê yekê ne hewceyê çîrokeke din bû. Di çîrokê de desthilatdarî û îqtidar nebû. Cembelî ji bo evîna xwe dest ji mîrekiya xwe berdabû, ango desthilatdarî binpê kiribû. Xwe berdabû çiya, dol û newalên Kurdistanê.



Cemre Kiral

Yekem pirtûka kurdî ya ku min xwendiyê, “Birîna Reş” a Apê Mûsa ye. Ew roj baş tê bîra min; rojê germ a havînê bû dema min pirtûk rahişt û li kêleka yek ji darên spîndarê yê Purguya Meletiyê min dest bi xwendinê kir. Di salên zanîngê de dema ku min dest bi fêr-

bûna kurdî kir, min pirtûka “Birîna Reş” a Musa Anter nas kir. Ji xeynî pirtûka yekem a kurdî ku min xwend, di heman demê de pirtûkek bû ku ez pê re hatibûm ser xwe. Ji ber ku ew çîrokek bû ku min dizanibû, ez jê re ne xerîb bûm. Ji ber vê yekê ji bo min pir bi qîmet e. Dema min pirtûk dixwend, min bavê xwe didît, ku bi mûcîzeyekê, ligel 4 bira û xwişkeke xwe sax filitibû. Ji bo min “Birîna Reş”, ferhenga ewil bû ku tê de maneya peyvên ku min nedizanî, hîn bûm.



Mîna Xezal

“Destana Kawa” ya Arjen Arî bû. Arî di vê berhema xwe de destana Kawa bi şirovekirina xwe ji nû ve nivîsandiyê. Zimanê berhemê

ewqas xurt e ku dema mirov dixwîne ji zilma Dehak hêrs dibe û heyraniyê lehengiya Kawa dibe. Gava meriv tê dawiya pirtûkê edî nikare hêsrên xwe bigire.

*“du hezar sal e me da neqedyayê
û em î Kurd man û ax jî Medya
çar parçe be jî, mêtîngêh be jî
gorna me bû vir û jîna me jî...”*



Ünal Adıgüzel

Li gundekî Serhedê min çavê xwe bi kurdî vekir. Ji ber vê yekê ez xwe pir bi siûd dibînim. Piştî demekê min berê xwe da zanîngê. Helbet heta wê demê nivîsandin û xwendina kurdî qet nedihate hişê min. Cara pêşîn di zanîngê de pêrgî peyva “akademîk” hatim. Kesên bi wî awayî diaxivîn li gorî me hevalan mirovên pir zana dihatin hesabandin. Wê demê

hevalekî me pir bala min dikişand. Wî hevalî li ser Facebookê her tim bi kurdî dinivîsî. Min jî bi nezaniya xwe di dilê xwe de tiranên xwe pê dikirin. Min digot ev çima tîpa “î” yê nanivîse. Hin caran jî min digot qey klavyeya wî wisa dinivîse. Wext bihurî min jî ew tîp bi kar anî û ji nezaniya xwe ya wê demê fedî kir. Min cara pêşîn bi kurdî pirtûka Mehmed Uzun a bi navê “Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirîne” xwend. Bi hestên kêfxweşî û serbilindiyê ez sermest bûbûm. Her wiha di hişûbîra min de peyvên nû ji xwe re warek ava kiribûn. Hişûbîra min azadiya xwe bi peyvên nû pîroz dikir. Şabûna min wek şabûna zarokên cejnan bû..

ÇI YE EV METAVERSE!?

Rodî Ekinci / Wedat Akdaş



@BitcoinKurdi



@btc_Kurd

Koma telegramê:

@BitcoinKurdi



-Meneya navê wê

Meta: -yeke din

Verse: Gerdûn

Meta-Verse: Gerdûneke din

Meta-Verse, tiştêkî wisa ye ku hemû cîhanên nîgaşî di hundirê xwe de dihevin û di nav wan cîhanan de em dikarin hemû danûstandinên xwe bikin. Di MetaVerse de her platformek cîhanek e û em dikarin mal û milkê xwe yê di wê cîhanê de, bi riya "Blockchain" ê transferî cîhanekê din bikin û koç bikin cîhanekê din. An jî di heman demê de ji kîjan cîhanê re çî tişt hewce be em dikarin wî tiştî transferî wê cîhanê bikin. Di siberojê de dibe ku bi hezaran platform werin bikaranîn. Her şirket wê platformekê veke û bi riya "Blockchain"ê dê bi hev ve jî girêdayî bin.

Meta-Verse hîn di jiyana me de bi tevahî bi cih nebûye. Lê hinek platform hene ku çend têgehên Meta-Verse de di nav xwe de dihevin. Li ser meta-verse de tiştê ku herî tê zanîn, niha ji hêla lîstikên vîdyoyê ve tê pêşkêşkirin.

Li gorî pêşdîtinên pisporan jî, ji ber ku hemû danûstandin wê li ser tora Blockchainê bê kirin, pereyê krîpto ji bo van platformên Metaverse de wê gelekî maqûl be.

-Ev mîrata Metaverse kengî derket?

Peyva "Metaverse" yê cara yekem di sala 1992yan de di romana fantastîk a Neal Stephenson de derbas dibe. Di 3 salên dawî de bîngeha Metaverse ava bû (sererastkirinê hê jî didomin). Di sala 2021ê de jî bi nav û deng bû û kete rojevê.

- Çima ewqas ket rojevê?

Bersiva vê pirsê wê gelekî klîşe be lê em dikarin bêjin: Kapîtalîzm. Ji bo sermayedar û şirketên mezin Metaverse qadeke rêvekirî ye û sermayedar dixwazin nan ji vê qadê jî bixwin. Ji ber wê ket rojevê û wê bi salan jî di rojevê de bimîne. Şirketên weke Facebook, Twitter, Microsoft dixwazin bibin "Rîspî" yê vê qadê û berê hemû şîxulên xwe dane vê qadê.



-Mirov dikare pê bawer be?

Ji bo baweriyê pêşî fehmkirin pêwîst e. Ji bo her tiştî ev wisa ye. Em dixwazin ku Metaverse were fehmkirin;

Ew eraseyên ku niha li ser platformên neewle tên firotin, ne Metaverse ne. Niha di Metaverse de erse, xanî û hwd. nayên firotin. Kesên ku ji van platforman erse kirîbin em dixwazin ji wan re bêjin ku Pira Malabadê niha di destê me de ye û kî bixwaze em dikarin bifroşin wan. ☒

Metaverse ji erse û xaniyan zêdetir e. Mînakeke biçûk: Çend salên din şirketên pêşketî wê di Metaverse de civînên xwe bikin û karkerên wan şirketan wê bi "avatar"ên xwe yê Metaverse herin wan civînan.



Mînakeke din: Em ê berçavka xwe bidin ber çavê xwe û di Metaverse de wekî ku em li stadyumê bin, bi ambîyanseke zindî û 3D li maça Amedsporê temaşe bikin. Îca kî dixwaze çî sloganê berz bike dikare berz bike. ☒

Metaverse di heman demê de kar û kargehên nûjen jî bi xwe re tîne. Yek ji van karan jî avahîsazî û endezyariya 3D ye. Yanî çawa ku avahîsazek projeya avahiyekê çêdike û endezyar jî li gorî projeyê avahiyê lê-

dike, ji bo Metaverseyê jî mîmar û endezyar dê projeyên avahiyên gerdûna Metaverseyê çêbikin.

Ev mînak belkî ecêb were lê şofêrekî kebçeyê li Batmanê, bi xêra teknolojiya Metaverseyê dê bikaribe hîmê şantiyeyeke li Hewlêrê deyne. Ji bo vê tenê Joystick û berçavkek bes e. Herwiha dixtorekî li Wanê dê bişê emeliyata nexweşekî li Efrînê bike.

-Însan çima dixwazin ji metaverseyê erd û zeviyên bikirin?

Van rojan di devê herkesî de ye; ku li Metaversê erd, xanî û dikanan bikirin ez ê çend salên din bibime milyonê. Lê rastîya


vî îşî ne wisa ye. Em hînekî behsa vê meseleyê bikin. 4 Metaversên Pêşketî hene :

- 1-Sandbox
- 2-Decentraland
- 3-Somnium Space
- 4-OVR


Em dikarin Sandbox , Decentraland û Somnium Spaceyê bişibînin pasajên wek Pasaja Japonan, Pasaja Ewropayê, Pasaja Parîsê. Yanî di wan pasajan de kompaniyên mezin bi fiyeta 50.000-100.000 dolaran dikan û erdan distînin, di wir de pêşaneyên xwe dikin û lîstikên xwe difroşin. (Ji ber ku hejmara parselên van Metaverseyan kêmtir in û ev metaverse bi proje û bingeh in fiyeta wan biha ne.)

Lêbelê Metaverseyê OVR'yê dezgeheke pir mezin e. Nexşeya dinyayê veqetandine 1.7 trilyon parselan û bê proje û bê vîzyon wan parselan difroşin. Fiyeta parselan jî ji 10-15 dolaran dest pê dike heta 10.000 dolaran diçe. Li gorî îstatîstîkan; yê ku herî zêde van parselan dikirin jî gelên Rojhilata Navîn in.

Wekî hûn jî zanin gelên Rojhilata Navîn di nava tinebûnan de tînin jiyanê û bi jiyanê neke dijwar emrê xwe derbas dikin. Dewlemendî ji bo wan xeyaleke pir mezin e. Di heman demê de heger hinekê lêkolîn bikin



Metaversa Sandbox'ê



Metaversa decentraland'ê

hûn ê bibînîn ku meseleyeke her kesî heye ku di wextê xwe de bav û kalê wî erdekî ku zemanê berê bê qedr bûye lê niha pir bi qîymet e, belaş firotîye an jî ji dest daye. Mînak kalikê min di orta Batmanê de 700 donim erdê tapûkirî daye bi kereke boz.. Mixabin di bîra her kesî de meseleyên wisa trajîk hene û herkes ji ber van awayan bê dilê xwe duayan ji bav û kalên xwe re dike :) Lewma jî her kes ji bo neviyên wan ji wan re nebêje we çima ji Metaverseyê erd nekirî dixwazin mîrasekê ji wan re bihêle. Bingeha vê meseleya erd û erseyên Metaverseyê jî wisa ye bi ya me.

-Kurd çawa lê dinêrin?

Mixabin heta niha li gorî ku me dîtiye, kurd di vê qadê de jî li paş in. Em dixwazin ku di her qadê de kurd bi zimanê xwe pêşketî bin û di vê şoreşa teknolojîk de jî cihê xwe bigrin.

-Bajarên kurdan lê tèn kirin?

Xwediyê platforma “neewle” kîjan derê

bixwaze dikare bifroşe. Lê qet û qet em niha pêşniyaz nakin. Berî niha jî me got; niha di Metaverseyê de erse û xanî nayên firotin. Ê ku niha tèn firotin “dezge” ne.

-Îhtimal heye ku siberojê li ser mal û milk, li metaversê şer derkeve?

Bellî nabe☺

-Gelo çi eleqeya Metaversê bi pereyên kriptoyan heye ?

Eleqeya wan bi vî şeklî heye. Çawa ku li dinyaya resen ji bo meriv danûstandinan bike pereyên fizîkî hewce bin, li dinyaya Metaverseyê jî herwiha pereyêke elektronîk hewce ye. Ev pere niha pereyên kripto ne. Mînak li dinyaya Decenterlandê ji bo meriv danûstandinan bike divê di destê meriv de MANA coin hebin, li dinyaya Sanderlandê jî bo meriv danûstandinekê bike an jî lîstîkekê bilîze divê di destê meriv de SAND coin hebin.



Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêviya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheke sazîtiyê bide kovargeriya kurdî, kovargeriya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgrêkên kovarên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.

Kovarên Endam



[@KovargerênKurd](#)

KovargerênKurd@gmail.com

POPKURD

Endama Koma Kovargerên Kurd e